# TU BI MAFÊN XWE DIZANÎ BIKAR TÎNÎ?



# TU BI MAFÊN XWE DIZANÎ GELO?

**GER KU TU HAT GIRTIN!**

**GER KU BIXWAZIN LI MALA TE BIGERIN!**

**GER KU BIXWAZIN LI SER TE BIGERIN!**

**GER KU MAFÊN TE BINPÊ BÛN!**

## TU DIZANÎ KU TU YÊ ÇI BIKÎ?

## GELO POLÎS Û CENDIRME DI KÎJAN REWŞÊ DE DIKARIN TE BIDIN SEKINANDIN?

Divê polîs, pêşi nasnameya xwe ya polîsiyê derxin û nîşanî te bikin ku wa ye ew polîs in. Piştî vê ew dikarin, mirovan û wesayitan bisekinînin. Armanca polîsan ew e ku; nehêlin sûcek bê kirin, nehêlin kesên ku sûcek kiribin birevin, fêr bibin ku ka kê sûc kiriye, kesên ku bi biryara dadgehê li wan digerin bi dest bixin û jiyan û hebûna mirovan biparêzin.
Ji bo ku polîs te bisekinîne, divê sedemeke wan ê maqul hebe. Ew nikarin te ji kêfa dilê xwe re, belasebep, dûr û dirêj bisekinînin.

## Polis an jî cendirme di kîjan rewşê de dikarin nasnameya te bixwazin?

Piştî ku polîsan nasnameya xwe ya polîsitiyê nişanî te dan divê ew ji te re bêjin ka çima te sekinandine û li ser vê sedemê ew dikarin pirsan ji te bikin û nasnameya te an jî ewraqên ku dixwazin bibînin ji te bixwazin.

## Gelo di kîjan rewşan de ew dikarin li ser te bigerin, an jî li wesayita te bigerin?

Bipirse ka kesên ku dixwazin li ser te bigerin kî ne.
Bipirse ka destûrnameya wan a ku karibin pê li ser te bigerin heye an tune ye.
Ji bo lêgerînê divê dadger (Hakim), di rewşên awarte de jî amîrê ewheliyê ev destûr dabe.

Ger ku destûr ji aliyê amîrê ewlehiyê ve hatibe dayîn divê ev biryar di hundirê 24 saetan de ji aliyê dadger ve bê erê kirin. Ev biryar ku ji aliyê dadger ve neyê erê kirin, tu hikmekî vê biryarê nîn e. Ji ber wê yekê teqez lêkolîn bikin ku, lêgerîna ku di derheqê we de hatiye kirin ji aliye dadger ve hatiye erê kirin an na.

## Gelo di kîjan rewş û çi wextî de ew dikarin li mal û kargeha te (û hwd.) bigerin?

- Nasnameya wan bipirse.
- Bipirse ka destûra wan heye an na. Ev destûrname divê bi niviskî be û destîşana (îmze) dadger li ser hebe. Vê destûrnameyê bixwîne ka navê te tê de heye an tuneye û destûr ji bo kîjan roj û saetê ye.
- Ger ku rewş lezgînî be, Dozger an jî mezinê polês û cendermeyan jî dikarin biryara lêgerînê bidin û destûrnameyekê amade bikin. Lê jibîr neke û destûrnameyê bixwîne ka navê te nivîsandine an na. Tu bi xwe bixwîne ku ka ev biryara lêgerînê ji bo kîjan roj û saetê ye. Ger ku ev tişt di destûrnameyê de ne nivîsandî bin ev destûr ne lê ye û ne hiqûqî ye. Ger ku wisa be tu xwedîmafî ku nehêlî li mala te an jî li kargeha te bigerin. Divê ew zebitnameya lêgerînê (Arama Tutanagi) binivîsînin ku wa ye ew hatine li malê an jî li cihê te digerin. Ger ku destnişana (îmze) te bixwazin tu ne mecbûrî bi ya wan bikî, tu dikarî destişan nekî. Ger ku tu bixwazî ew mecbûr in ku yekê ji vê zebitnameyê bidine te jî.

• Li gor qanûnê, qaîde ew e ku ew nikarin bi şevê li mal û kargeha te (û hwd.) bigerin. Lê ku rewşeke lezgînî hebe yan jî di rasthatina sûcekî de dikarin bi şevê jî lê bigerin.

• Ger ku Dozger ne bi polîs an jî cendirmeyan re be, divê du kes ji azayên gundê te/taxa te an jî ji cîranên te bi wan re bin. Ger ku di wê kêliya lêgerînê de ew ne amade bin polîs an jî cendirme nikarin li wir bigerin.

## PIŞTÎ KU TE GIRTIN Û HEYA KU TE BIBIN DADGEHÊ MAFÊN TE ÇI NE?

• Bipirse ka kesên ku dixwazin te bigirin kî ne û nasnameya wan bixwîne.

• Bipirse ka ew çima te digirin. Divê ew li gor qanûne te bigirin. Ji kefa dile xwe re nikarin te bibin tu ciyan.

• Divê ew derhal ji te re bêjin ku ka çima te digirin. Li gorî qanûnê, ji xeynî kesên ku xwestine, birevin an jî dikarin zirarekê bidin xwe yan jî kesên din, destê tu kesî nayê kelemçekirin. Ger ku ji kêfa dile xwe re te kelemce kiribin, teqez giliya kesên vî karî kirin, bikin.

• Ger ku tu hatî girtin an jî piştî girtina te Dozger biryarê bide ku tu dê ji rojekê zêdetir di destê polîs û cendirmeyan de bimînî ew mecbûr in ku vê yekê ji malbata te re an jî ji merivekî te re bêjin. Jixwe ew dê ji te bipirsin ka tu dixwazî bersivê bidî pirsên wan an na.

Ger ku tu bi neheqî hatibî girtin, di dema qanûnî de te dernexin pêşberî dadger, ku girtina te ji malbata te re negotibin, kul i gor zagonê tu hatibe girtin lê di derheqê te de biryara neşopandinê (takipsizlik) an jî beraetê hatibe dayîn, ku biryara lêgerînê ne li gorî rê û rêbazan hatibe kirin tu dikarî doza xwe li dewletê bikî û tezmînatê bixwazî.

## Rapora Bijîşk çiye û mafên te çi ne?

Piştî ku tu hatî girtin, beriya ku te têxin nezaretxanê ew dê te bibin cem bijîşkek (doktorek)î/ê. Ev bijîşk dê li te binihêre ka tu baş î an na. Divê tu û bijîşk bi tenê bin. Nabe ku hinekên din li cem we bin. Ev mafê te yê qanunî ye. Ger dilê te ji bijîşk nexweş be tu dikarî bijîşkekî din bixwazi û nehêlî ev bijîşk te tedawi bike. Piştî ku te bijîşkekî/ê din xwest divê ew, vê daxwaza te pek bînin. Piştî ku bixwazin cîhe te biguherînin, dozger biryarê bide ku tu dê ji 24 saetan zêdetir li qereqolê bî, te bibin dadgehê yan jî te berdin divê ew dîsa te bibin ba bijîşkekî.

Ger ku tu ne baş bî an jî tadeyek li te bûbe, li te xistibin, tu êşkence xwaribe qet metirse û van tiştan ji bijîşk re bêje. Piştî ku te ev gotin ji bijîşk re got; divê bijîşk van tiştan di rapora xwe de binivisîne. (Ev rapor delîlekî gelek girîng e.) Her cara ku te ji nezaretxanê derxin û bibin derve divê ew te bibin nîşanî bijîşkekî jî bikin. Beriya ku te vegerînin nezaretxane yê jî divê bijîşkek te muayene bike. Mafê te ye ku tu bixwazî rapora bijîşk bibîni û ew kopyayekê ji raporê bidine

te jî. Tu dikarî ji wan bixwazî ku parêzerê te jî dema ku bijîşk li te niherî li ba te be.
Dermankirina bi kelemçekirî tu carî qebûl neke. Jibîr neke ku, bijîşkê/a te bi kelemçê derman dike karê xwe ne li gorî rêbazan dike û berpirsyar e.

## Mafê Bêdengmayîne çi ye? Qanûn çi dibêje?

Piştî kêliya ku tu hatî girtin, kesên ku te girtine mecbur in ku ji te re bêjin ka mafên te çi ne.
Ger tu bixwazî, tu dikarî îfade nedî. Navê vî mafî Mafê Bedengmayîne ye. (Susma Hakki) Divê tu xwe bi wan bidî naskirin. Yanî tiştên ku di nasnameya te de nivîsandî ne ji wan re bibêjî. Wekî nav û paşnavê te, navê dê û bavê te, welatê te û nufûsa te. Lê ger tu bixwazî li ser sedema girtina xwe bêdeng bimînî ew nikarin ifada te bistînin. Ew dê bi tenê nasnameya te binivîsînin û bêjin ku va ye tu dixwazî bêdeng bimînî. Mafê bedengmayînê ne tenê ji bo kêliya îfadê ye. Ger ku bixwazin hinekan nîşanî te bikin ku ka tu wan nas dikî an na, yan jî te bibin cihê ku bûyer lê çêbûye û ji te bipirsin ka bûyer çawa çebûye dîsa tu dikarî bêdeng bimînî. Her wisa ji bo parastina xwe tu dikarî parêzerek jî bixwazî.

## Di kîjan rewşê de tu dikarî parêzerek bixwazî?

Kêliya ku tu hatî girtin mafê te ye ku ji bo parastina xwe parêzerek bixwazî. Tu ji ber kîjan sûcî hatibî girtin jî û parêzerê/a te tunebe jî tu dikarî parêzer bixwazî. Dê Baro ji te re parê-

zereke /î  ji kîsî xwe bişîne û heqzimanê parêzer ne tu didî, Baro dide. Tu ji polîs an jî ji cendirmeyan re bejî ku tu dixwazî parêzer bê bi te ve,  ev yek bes e. Ew dê agahî bidin Baroyê û Baro jî dê parêzerek/î bişîne.

## Mafên te yên din çi ne?

• Mafê te ye ku tu zanibî tu ji berçi û bi kîjan sûcî hatî girtin. Mafe te ye ku tu bixwazi tişten ku ji qenciya te re bibin delîl û jibo te baş bin têkevin dosyayê. (Lehe olan delillerin toplanmasi) Ji kêliya ku tu hatîgirtin ve her belge û ewraqên ku dixwazin tu destnîşan (îmze) bikî pêşî bixwîne. Ger ku ewraq ne bi dile te bin tu ne mecbur î ku wan destnîşan bikî. Tu dixwazî binivîsînî ku ka ji bo çi te destnîşan nekiriye. (Mafê jêrevîna destnîşanê.)

## PIŞTÎ KU TE JI BINÇAVAN DERXISTIN;

• Dibe ku ew dê te, bêyî ku bibin dadgehê, rasterast  serbest berdin. (Di vî halî de ew dê zebitnameyekê li ser berdana te binivîsînin. Ew mecbûr in ku yekê ji vê zebitnameyê bidine te jî.

• Dibe ku ew te bibin dadgehê û tu derkevî pêşberî dozger (sawcî). Li cem dozger jî mafê te heye ku tu bêdeng bimînî û parêzerekî/ê bixwazi. Piştî ku dozger ifadeya te stand an te yê berde yan jî ji bo ku tu bêyî girtin dê te bişîne pêşberî dadger (hakim). Piştî girtina te tadeyek li te kiribin, te êşkence xwaribe van tiştan hemû ji dozger re bêje.

• Piştî ku dozger, ji bo girtinê, te bişîne pêşberî dadger ; dê dadger îfadeya te bistîne.

Ger ku heta cem dadger parêzerê/a te tunebe tu bixwazî jî nexwazî jî dê parêzerek bê bi te ve. Li gor qanûnê heya ku parêzer ne amade be dadger nikare îfadeya te bistîne. Li vir jî mafe te yê bêdengmayînê heye. Piştî ku dadger îfadeya te stand an jî tu bêdeng mayî yan dê te berde yan jî dê biryara girtina te bide da ku te bişîne girtîgehê. (Ger ku tadeyek li te kiribin û te êşkence xwaribe van tiştan ji dadger re jî bêje.) Ger ji aliye dadger ve biryara girtina te bê dayîn tu dikarî li dijî vê biryarê di hundirê 7 rojan de bi daxwaznameyekê îtîraz bikî.

Li gor qanûnê Polîs an jî Cendirme dikarin te 24 saetan li cem xwe bihêlin. Biryara binçavkirina mirov, dozger dikare bide. Lê amîrê ewlehiyê jî di kêliya kirina sucên ku di zagonê de hatine eşkere kirin de heta bîst û çar saetan dikare biryara binçavkirinê bide. Di rewşên awarte û di dema sucên ji aliyê 3 an jî ji 3 kesan zêdetir ve tên kirin de ev dem 48 (çil û heşt) saet e. Hêzên ewlehiyê sedema binçavkirinê ji holê rabe an jî kar û barên binçavkirinê biqede, herî zêde di dawiya ev deman de divê agahî bidin dozger û li gorî talîmatên dozger bitevgerin. Biryara binçavkirnê, ancax diviyatiya vê tedbîrê û di derheqê sucê ku tê îddîa kirin de delilên şênber hebe dikarin bidin.

Kêmtirîn 3 kes ji ber sûcekî hatibin girtin dozger dikare biryarê bide ku ew heya 4 rojan di bin çavan de bimînin. Dema

dozger ev biryar da ew mecbûr in malbata te jî bi vê biryarê agahdar bikin. Tu dikarî îtîrazê li vê biryara dozger bikî. Dê dadger li ser îtîraza te biryarê bide (Sulh Ceza Hakîmî). Ger ku dadger vê îtîraza te qebûl bike, ew dê derhal te bînin dadgehê, pêşberê dadger. Ger ku dadger vê daxwaza te nepejirîne tu dê li benda xelaseka 4 rojan bimînî. Piştî 4 rojan ku te dernexin pêşberî dadger tu dikarî pirsiyaran gilî bikî û ji dewletê tezmînatê bixwazî.

Piştî kêliya ku tu hatî girtin pê ve mafê te heye ku tu parêzerê xwe bibînî.

Ger ku parêzerê/a te tunebe her roj û her saetê tu dikarî ji Baroyê parêzerekê/î bixwazî. Parêzerê/a ku bê bi tê ve dê heqdestê xwe ji Baroyê bistîne.

Dema ku tu hatî girtin tadeyek li te bûbe, te êşkence xwaribe tu dikarî giliya pirsiyaran bikî.

## GER KU TADEYEK LI TE BÛBE AN JÎ TE ÊŞKENCE XWARIBE DIVÊ TU ÇI BIKÎ?

Ger ku tadeyek li te bû yan jî êşkence li te kirin û tu bixwazî dozê li pirsiyaran bikî were serî li **Komeleya Mafên Mirovan** bide û alîkariyê bixwaze.

Ger ku li derve yan jî li qereqolan tadeyek li te bû û te êşkence xwar her tiştî ji parêzerê/a xwe re bibêje. Dema ku tu hatî girtin an jî te bibin dadgehê teqez dê bijîşk te muayene bike. Ger te tadeyek dîtibe û êşkence xwaribe giliyê xwe hemû yan ji bijîşk re bibêje. Lê binihêre ka giliyên te nivîsîne an na.

Dema ku te dît bijîşk guh nade te û giliyên te nanivîsîne tu dikarî bijîşkekî/e din bixwazî.
Ger ku tu birin dadgehê û derxistin pêşberî dozger û dadger (sawci û hakim) dîsa giliyên xwe tevan ji wan re bi bêje. Ji kerema xwe re her tişt ê ku tê bîra te bi lêv bike. Lewra ku te bi tade û êşkence îfade dabe, ev îfadeya te ne lê ye û dadger nikare li ser van îfadeyan te ceza bike.
Ger ku te eşkence xwaribe jibo tedawî û alîkariyê were **Weqfa Mafên Mirovan.**

## *Ev tiştên ku li jêr nivîsandî ne cûreyên tade û êşkencê ne yên ku zêdetirîn tên serê mirovan.*

Heqaret, Lêdan, Lêdana bi daran, Sîle, şeqam, Girêdana çavan, Gefên kuştinê, Gefên din, Gefên ku dê êşkenceyê li malbatê bikin, Qerf, Zimandirejîya Cînsel, Destdrêjiya Cînsel, Temaşyan jî bihîstina êşkencê, Muzîk û Marşên Dengzêde, Kuştina Derewîn, Astengiya li ber destavê, Felaqe, Asqî – Çarmîx, Asqiya Filistînî, Daleqana serserkî, Carmixa li parzemînê, Ceryan, Birçîhiştin – Tîhiştin, Ava bi tazyîk, Tenêhiştina di odeyeke teng de, Badana Gunikan, Sekana li ser zemîna cemidî, Hilkirina por rîh û simbêlan, Jêkirina por rih û simbêlan, Sekana li nav tiştên necis, Xwêxwarina bi zorê, Teklîfa Ajantiyê, Êşkenceya li ber çavên nas û merivan, Tazîkirin, Lidîwarxistin, Lêdana bi kîsê qumê, Lêdana li heman cîhî, Dirêjkirina li erdê û derketina ser laş an jî barkirina tiştekî giran, Gaza tuj (ya îsotan), Tecawiz, Tûkirina nava devê

mirovan, Mîztina li ser laşên mirovan, Westandina bi hareketên zêde, Şewitandin, Vemirandina cixareyan li ser laşan, Bikaranîna Tiştên Kîmyewî, Dirêjkirina li ser qeşayê-cemedê, Bêxewî, Sekana li heman pozîzyonê, Xwarina tiştên ne diyar a bi zorê, Sekinandina li ber pencereya vekirî, Bênefeshiştin, Xwestekên bêmane, Sekinandina bi kelemçeyê, Xeniqandin-Fetisandina bi avê, Tedawiya bi zorê, Êşkenceya tabutê, Nihêrîna li rektumê, Nihêrîna li vajînayê

## Qanuna Cezayê Ya Tirkiyê

### Êşkence

**Xala 94'an**- (1) Ew karmendê ku tadeyeke li dijî xîreta mirovahiyê ku bibe sedema êş û janên laşî û manewî, her wisa tesîrekê li ser ruh û bedena kesan dike pêk bîne dê cezayê wî ji 3 salan heya 12 salan cezayê hepsê be.

Danezana Mafên Mirovan a Navneteweyî

Xala 5'an-Dive êşkence li tu kesan neyê kirin, tu kes rastî tadeyên li dijî xîreta mirovahiyê neyê û bi vî awayî neyê cezakirin.

## Peymana Mafên Mirovan a Ewropayê

**Xala 3'yan:** Qedexeya Êşkencê

Divê êşkence û tadeya li dijî xîreta mirovahiyê li tu kesî neyê kirin û tu kes bi van rêyan neyê cezakirin.

Peymana Yekîtiya Neteweyan A Li Ser Qedexeya Êşkencê û

Tadeyê û Cezakirina Bi Van Rêyan

**Xala Yekemîn**

Li gor armanca vê peymanê; ku karmendek an jî kesek din ê ku li ser vî navî tevdigere an jî yê karmend ev rê û destur daye ber wan, ji ber şik û gumana sucekî û ji bo ku bi armanca cezakirinê agahiyekê an jî îtîrafekê bi dest bixin an jî ji ber sedemên cudakariyê, kirinên ku jan û êşeke giran a laşî û manewî bidin kesên din ê ku ji ber sucekî gumanbar in an jî ji ber kirinên kesên din ku çi wan ev suc kiribe jî û herwisa nekiribe jî, navê vê pekanînê êşkencê ye.
Êşkence sûcekî li dijî mirovahiyê ye, bêdeng nemînin!

## GELÎ JINAN HÛN MAFÊN XWE DIZANIN?

### Li Gorî Peymana Stenbolê Tûndiya Li Dijî Jinê;

***Tûndiya Li Dijî Jinê;***

Pinpêkirineke mafên mirovan û têşeyeke cudakariya li dijî jinan e. An di qada fermî, an jî di ya taybetî de be, her cure helwestên ku ev sipartî zayendiya civakî ne; ji aliyê fizîkî, zayendî, derûnî an jî aborî zirar an jî êşê dide/dikare bide jinan, an jî bi van fiêlan tehdî kirin, zor lê kirin an jî bi kêyfî wan ji azadiyên xwe bêpar hiştin e.

***Tundiya Nav Malbatê;***

Lêkirinên Tundî yên fizîkî, zayendî, derûnî an jî aborî yên ku di

nav malbatê, xênî, an jî mexdûr û kesê tundiyê lê dimeşîne heman malê par bikin an nekin, hevserê niha an yê kevn an jî di navbera partneran de pêk tên, in.

***Ger Ku Hûn Rastî Tundiyê Hatin Tiştên Hûnê Karibin:***

Li gorî Zagona 6284'an a bi navê Zagona Di Derheqê Parastina Malbatê, Kesê ku tundiyê dike hevser, bav, zar an partnerê we yê ku hûn bi hev re dijîn be;

Hûn dikarin bi serlêdana qereqol an jî dadgeha malbatê, kesê tundiyê li we dike ji malê dûrxin, bi dûrayiyekê nehêlin nêzî malê bibe, we li kargeha we aciz neke, ku çeka wî hebe dest danîna çeka wî, bi navgînên ragihandinê nikaribe we aciz bike. Di heman demê, tedbîrên din ên ku di zagonê de hatiye eşkere kirin jî hûn dikarin bixwazin.

Ku hûn difikirin ku kesê tundiyê li we dike dê êrîşî ewlehiya can û malê bike, hûn dikarin bi navbeynkariya dozgeriyê herin Mala Stargeha Jinan.

Kesê tundiyê dike ku yê di derheqê wî de biryara tedbîrê hatiye dayîn, li dijî vê biryarê bê û we aciz bike an jî bixwaze tundiyê li we bike serî li dozgeriyê din. Di vê rewşê de, di derheqê kesê li dijî biryara dadgehê tevdigere heta 6 mehan biryara hepsê tê dayîn.

Ji Gerînendetiya Tapuyê Şerha "Xaniyê Malbatê ye" Bixwazin.

Di nava zewacê de ger hûn naxwazin xaniyê hevpar yê malbatê ji aliyê hevserê we bê firotin, ew çax xaniyê ku hûn wek xaniyê malbatê bikar tînin girêdayî kîjan Gerînendetiya

Tapûyê be ji wê gerînendetiyê, şerha "xaniyê malbatê ye" bixwazin.

**Li Dijî Tacîz û Destavêtinê Bêdeng Nemîne, Gilî Bike!**

Ger hûn rastî havildarbûna zayendî, tacîza zayendî an jî destavêtinê yên ku di zagona cezayê (TCK.) de hatine tarîf kirin, hê palpiştên (delil) li ser we wenda nebûne, serî li qereqola herî nêzî we bidin û bibin gilîdar. Berî wenda bûna delîlan, gihandina wan a meqamên edlî ji bo ceza kirina kiryaran pir girîng e.

**Ger Hûn Dûçarî Mobbînge Bûn;**

Kesên xebatkar – bi taybetî Jin- ger ji aliyê kesên ser wan an jî kesên din ên di heman kargehê dixebitin ve dûçarî mobbingê bûn, di derheqê kesê mobbingkar de dikarin serî li riyên hiqûqî bidin.

Li gorî Xala 105/2'an a Zagona Cezayê (TCK.) ger kiryar bi bikaranîna hîyerarşî an jî hesthilatiya ji têkiliya xebatê tê, havildarbûna zayendî bike, cezaya ku di derheqê wî de dê bê dayîn bi nîvê cezayê zêde dibe. Ji ber vê lêkirinê ger mexdûr dev jin karê xwe berda be, cezayê ku dê bê dayîhn ji salekê kêmtir nabe.

*MIROV,*
*BI MAFÊN XWE MIROV E*

KOMELEYA MAFÊN MIROVAN
1986

**ŞAXA AMEDÊ**
**YA KOMELEYA MAFÊN MIROVAN**


Ali Emiri 1.Sok. Yılmaz 2004 Apt. No: 1/3 Yenişehir/ DİYARBAKIR
**Tel:** 0412. 223 30 33 - 229 58 66 **Faks:** 0412. 223 57 37
**E-Mail:** diyarbakir@ihd.org.tr **Web:** www.ihddiyarbakir.org
**Twitter:** @amedihd